

Pakrewana serpiyan**Çîrok**

Mihemed Qere Hesên

Mala sîfliyê bişewte, mirov bi xweşî di qaska çembil de, bê av dikele, ne hulm ne jî bihn jê hildikele; di xilmaş û kerîya felekê de, di çav damirtin û kûriya dadê de, bext reş û kirasê ji êgir, Henîfe di bezê xwe de diqewirî. Weha wê ew tişt bi bîra xwe tînan, bi dilê qijilî li ber deriyê male- yê bi zingarê boyekirî- rûniştibû. Ew xaniya di paşîya taxa Şêx Meqşûd xerbî de, bi kelpîçên sipî yên ji çementoyê rij û ji ode nîvkê, hatibû ava kirin. Fîstanekî ji pîna hatibû çançanîkirin li xwe kiribû. Mîna kurkekê çêlik li dorê dilîstin. Lê haya wê ji sê zarokên xwe tunebû, guhên wê ji dorhêla xwe kilît kiribûn, bi hêvî ramanên xwe firibû roja ew û hevalên xwe li riya çûn û hatina dibistanê dilîstin, weke çêlikên qumriyên xeşim, rojên bê jê ve xuya netên, basik li hev dixistin. Di ber re keser û hulmek dû jê hildikele dikşand. Pirs in ne nas ji xwe dikirin.

Çima min xwendina xwe bi serî nekir ?!

Çima min zû hez kir ?

Çima bavê min ez tavilê dame mêr ?

Felek ji min qeherî, bi wê jî nekir hê mêrê min ê ciwan, bi qotikê ji min stand. Ev komên sêwiyên nikarin bifirin, di stuyê min de hiştin.

Ji nişka ve, giriyê lêw ê sê salî, ew şiyar kir. Ewê bê derpî, di goleka ava kom bûye û gemirî de, digel keleşêr û mirîşkan dilîst. Gava law vir de û wê de dibezî, kurmikê sinet nekirî dinav nigan de dihejî, çavên keleşêr lêketibûn û nikil dikir vê re qêrînî pê diket. Bê hemdê xwe bezî kurikê xwe. Çi bûye ? Çi bûye ? Çav li xwîna ji nav nigên lêw diçû ketin. Dizanî çi bûye?. Bi kevîran dev ser keleşêr û mirîşkan dikir, wan jî dikir qît-qît, basik li hev dixistin û direvîn. Bi lez diçû hinder, paçek ji famîlê wan ê pizirî çirand, pê nav lingê lawê xwe girê da.

Ew êvarê li benda keça xwe ya hefdeh salî bû, ku ji karê terziyê were, qisaweta wê

-mîna marekî serpehin bi hinavê badida- bi tirs bû, ku goştê wê yê teze bi xavî were xwerin. Çavên wê li benda vergerê mîna stêrkên dûr di şeva bê heyv de kûrik bûbûn. Ji te ye rûyê wê şevşalek reş e du qul lê ne. Her roj ev rewşa xwe bû; ra keç ji kar vedigerî.

Wê şevê ji ber bîna nexweş, ku ji sergoyê li rojavayî malê boşkirine gêj dibûn. Êrişa refên pêşî û micîqan- weke firokên soxoyî- dikir hum hum û zixtên xwe mîna mûjeka davêtinê. Xew ji çavan dibûn kew û difirîn, tevî hiş govde dibû, weke masiya bi ganî di nivînê sêlê de bê zêt xwe teqle dikir û dibrijî. Berî berbangê piçkê govde xwe ji bîr kir û çav mîna du kevokên di petrolê werbûne nirkarin bifirin di cî de los dibûn.

Wê nizanî çawa çûye meydana Seidela Cabîrî, û pêrgî mêrê xwe tê, wêneyê mixtarê gund di dest wî de ye, yê bi coşî hildide û bijî dike, deng ketiye. Tavilê dibeze ba û bi milê digre û diçelqîne. Ew li rastî xwe mêze dike, çav li jinê dikevin, ziq radiweste û jê re dibêje: Te çawa zarok li mal bi tenê hêştine ? Wê bitiresin ! tiştan bişkînin, bi ser xwe de gêrin...

Jin jê dipirse: Min tu ji mêj ve nedîtiye, li ku yî... ?

Ez çûme ba mixtêr.

Ne mixtar miriye, tu çawa çûyî ba wî.

Erê erê, ew bi laş miriye, lê kirarên wî di nav me de zindî ne. serî ber jor dike û li wêne dinêre û dibêje: Ne weha ye mixtar. Ew jî tev komê bi refîk serê xwe dihejîne: Erê weha ye weha ye...Jinik ji sawa kirarên wî re bê ku birame min a xortê nuh bûye leşker, nigan dide ber hev dest radike û silavliqê jê re lêdixe.

Bi dengê lédana lingê xwe re şiyar bû, û dengê mixiltiyekê ji derve li guhan ke?. Ew bi govde xwe yê mîna marekî tevizî, ji nav nivînê bi dizî kişand li paşa derî kilor bû, û ji xwe re got: Hê segan xew nekiriye **D.R (8)**